şopdara rastiyê ye
Ronahî
Hejmar :459 nameronahi@gmail.com 03- Cotmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Mûnetê zivistanî dêpoya çile û parastina çande







Ferîşte NEZÎR

Jin bi nêzîkbûna demasla zivistanî re bi karê çêkirina xwarinên zivistanî re mijûl dibin, wekî ku gotinên pêşiyan dibêjin “Mûneta malê rehetiya balê”. Ku di destpêka meha payîzê de jin amedekariyên xwarina zivistanî anjî “mûnetê malê dikin”. Dayîk bi vê mebestê zebzeyên wekî bamî, lopik, kundir, îsot û hwd.. zuwa dikin, ji fêkiyan wekî tirî, hejîr û kundir leçer çêdikin. Her wiha tirşo, mekdûs, zeytûn û birxul gelek têştên din ên xwerinê amade dikin.

**MEHA ILONÊ HAZİRTİYÊN MÛNET DİKİN**

Dayîka bi navê Cîhan Çeto jî yek ji wan dayîkên ku amedekariyên xwarina zivistanî dike, derbarê mijarê de anî ziman ku hazirtî û çêkirina mûnet mîna çandekê ye û kêfxweşin ji ber ku hemû jin li hev dicivin û alîkariya hev dikin û wiha got:”Em jin her sal di dawiya mehên havînê de ji Ilonê ve dest bi amedekariyên xwarinên zivistanê dikin, ji ber ku Pariyê xwarinê yê ku bi destan tê çêkirin xweş û erzan e. Ji ber ku di demasala zivistanê de her tiştek nayê dîtin û ger hebe jî pire-ye wê buha ye, tiştên bi destên dayîkan tên amadekirin tu kargeh nikare wekî wê xweş û baş çêke.”

**ŞÎNKAHÎ HİŞKDİKİN**

Cîhan bal kişand ser sebzeyên çêkirina mûnet hişk dikin û wiha got: “Her malek li gorî meznbûn an jî biçûkbûna malbatê hazirtiyên xwe dike, ku ez nêzî 20 kîlo ji miloxiyê dikirim û ji bo zivistanî hişdikim, her wiha bamî, kusa û bacanê reş ji bo dolmeya hişdikin û wekî dêpoya zivistanî hiltînim. Xwerinên di qetrimîzan de ku her sibeh û şîvan di dema çilet de li ser sofreyê hazir dibe wekî zeytun, megdus, penêr, tirşo û leçer ji fêkî û sebzeyan çêdikin, xweşikbûnekê ser sofreyê çêdike.”

**ÇÊKİRNA MÛNET MÎNA ÇANDEKÊ YE**

Dayîka Cîhan bi bîr xist ku netenê sebze û fewkî munetê zivistanî, her wiha wekî genim, nîs û nokin jî û wiha got: “Di hazirtiyên xwerinên zivistanî de genim, nîs û nok jî heye wekî genim bi gotina civakî de bibêjinê “Danûk” genim di sîtileke mezin de dikelînin û li sewr xaniyan radixin da ku zuha be. Piştre dibin aş û jê arvan, birxûl, serkê birxûl û danê simîdê.. hwd çêdikin, her wiha Nîs jî wekî nîskê sor û yê hebî bi nav dikin çêdikin.”

Dayîka Cîhan Çeto da zanîn ku ev hazirtî him ji bo mûnetê malê ne û him mîna çandek di civakê de me ev wekî mîrate ji dayîkên xwe girtine. Û wiha bi dawî kir: “Di be ku ev xwarinên ku ji bo zivistanî hazir dikin, li bazaran hebin, lê wê ne mîna ku ew dayîk bi dest û keda xwe çêdikin, her wiha bi vê wesîleyê çand û mîrateya dayîkan diparêzin.”


# Yekemîn yaneya jinê li Herêma Cizîrê desturname digre



Yaneya Qendîl a jinên werzîşê li bajarê Qamişlo, ku li gorî rêzîknameya werzîşê ya ku beriya demkê hatibû sererast kirin, ev yaneya ji Yekîtiya Werzîşê daxwaza desturnameya pêşkşê kiribû. Yekîtiya Werzîşê li avahiya xwe ya li bajarê Qamişlo di 26’ê Îlonê ku ev yekemîn yaneya jin a werzîşê desturnameya demkî ser salekê werdigre. Ku di wê yaneyê de beşê fitbolê, Baskêtbol, şetrenc û pîngbon heye, d aku ev yaneya pêşbikeve û xwe ferh bike, hêviya alîkariay madî û manewî ji cihêtêkîldar dike.

**ARMANC XURTKİRİNA WERZÎŞA JİNÊ YE**

Armanca ji vê gavê ku aqda werzîşê netenê ji bo mêr bimîne, ku di civakê de lîstika baskêtbolê tenê ji bo zilam tê dîtin. Pêwîste wekî Yekîtî û Desteya Werzîş û Ciwanan di vê gava ku yaneya Qendî avêtî de alîkar bin. Ji ber tevî ku di her yaneyekî de Hevserokatî heye jî, lê di milê xebatê piratîkî de tîmên jin lawaz maye, Ku tîmên jinan di yaneyan de hene, lê tenê yaneya Qamişlo, Ehlî Amûdê û çend dêdin pêşdikevin jibilî wan yaneyên jin tenê di asta şeklîde mane. Her wiha ku Yaneya Qendîl ya tîma fitbolê li dibistana Seqir Qureyş a li taxa Hilêliyê, tevî ku ewder ne li gorî pîvanên werzîşê taybet fitbolê ye lê, ji kêm derfet 30 lîstokvan perwerdên xwe dibînin.”



**Lİ GORÎ GAVÊ DÊ ALÎKARÎ BÊ DAYÎN**

Di yaneya Qendîl de lîstikên wekî şetrend ji 6 lîstikvan û pîngbon ji 8 lîstik vanan pêk tê, tevlî bûna jinan ji vê yaneyê re gelek, lê ji kêm derfetî pêşketin lawaze. Da




ku ev yane û qada werzîşê taybet bi jinan pêşbikeve, pêwîste cihên têkîldar taybet bi jinê wekî Yekîtiya Werzîşê û Desteya Werzîş û Ciwanan alîkariya yaneyê di milê madî û manewî jî bikin. Ji ber ku ev gevek yekemîne ku yaneya jinê tavê û hewcedarî alîkariyê ye, her wiha yaneya fotbolê cara yekemîn tevlî şampiyona kopê ya fotbolê ya jinan dibe, ku wê bi tîma Biratî ya jinan re maçê bilîze. Ev yekemîn yaneya jin di herêmê de gavek girîng û pêşketî tavêje, dê cihên têkîldar ji bo pêşketina vê yaneyê alîkariya pêwîst dibin.” *Ronahî/Qamişlo*



şopdara rastiyê ye
Ronahî
nameronahi@gmail.com Hejmar : 459 03- Cotmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Divê hikûmeta başûr li ber dagirkeriyê rabe

Artêşa Tirk ya dagirker nêzî 30 km axa başûrê Kurdistanê dagirkiriye. Nerazîbûna welatiyên başûr li dijî dagirkeriyê her roj zêdetir dibe. Lê hikûmeta başûr ti helwestekê nîşanî dagirkeriya Tirk nade. Welatiyên herêma Biradostê dagirkeriya Tirk şermezar kirin û diyar kirin hikûmeta herêmê hevkarê vê dagirkeriyê ye. Welatiyan xwestin ku hikûmeta başûr li dijî dagirkeriyê rabe. ***R-5***



# DAIŞ Û NUSRA LI EFRÎNÊ BI CIH DIBIN

**Serokkomarê Tirk Recep Erdogan û hikûmeta wî ku xwedî zihniyeteke Ixwanî Muslumîn û El Qaîde ne ji aliyê hemû cîhanê de êdî rastiyeke ku nikare bê veşartine. Komên çete yên weke DAIŞ û El Nusra jî ku bingeha wan El Qaîde ye li gor fermanên Erdogan tevdigerin.**





### HEVKARIYA ERDOGAN, DAIŞ, EL NUSRA

Dewleta Tirk ji destpêka aloziya Sûriyê de piştgiriya komên çete dike û di kûrkirina aloziyê de xwedî roleke girîng e. Herî dawî di 20’ê Çile de bi komên çete yên ku navê artêşa azad li wan kiribû êrîşî Efrînê kirin û Efrîn dagirkirin.Hat ragihandin ku niha jî çeteyên DAIŞ û Cebhet El Nusra ku navê Heyet Tehrîr El Şam li xwe kiriye li Efrînê tên bi cih kirin.

### BI DEHAN ÊZIDÎ HATIN REVANDIN

Ji aliyê din ve leşker û çeteyên dagirker kiryarên xwe yên hovane yên weke kuştin, talan, revandin û dizî berdewam dikin. Hat ragihandin ku bi dehan Êzidiyên gundê Qîbarê, di nav de jin jî hebûn, dema ku dixwestin biçin nava darên zeytûnan, ji aliyê leşker û çeteyên dagirker ên Tirkiyê de hatin revandin û birin cihekî nediyar. ***R-2***



## Erdogan DAIŞ’î ye, Ixwanî Muslimîne

Endamê Komîteya Rêveber a PKK’ê Dûran Kalkan gefên serokkomarê Tirk Erdogan yên li ser bakurê Sûriyê nirxand û diyar kir ku Erdogan bi gefên ku li rojhilatê Feratê dike, bi xwe xema herêmên ji çeteyên DAÎŞ’ê hatine rizgarkirin dixwe. Kalkan got, “Erdogan DAÎŞ’î ye, Îxwan-î Muslumîn e.” ***R-4***

## Polîtîka AKP’ê bi DAIŞ’ê re li dijî Kurdan bû

Serokwekîla Koma HDP’ê Fatma Kurtulan diyar kir ku AKP’ê Tirkiye xistiyie nava kriza Rojhilata Navîn û wiha got: “Bi DAİŞ’ê re ketin nava hevkariyê. Polîtikaya AKP’ê ya bi DAIŞ’ê re li dijî pergala Kurdan bû. AKP bi vê polîtîkayê welat xist nava celb û krîza Rojhilata Navîn.” ***R-4***

## Di Şerê Tunekirina Terorê de 29 çete hatin kuştin



Di Qonaxa Dawî ya Şerê Tunekirina Terorê a Pêngava Bagera Cizîrê de pêşde çûna şervanên QSD’ê ber bi bajarokê Hejîn ve dewam dike. Şervanên QSD’ê derbên giran li çeteyên DAIŞ’ê didin. Navenda Ragihandinê ya QSD‘ê ragihand ku di 24 saetên dawî yên Şerê Tunekirina Terorê de 29 çete hatin kuştin û 3 erebeyên bombebarkirî hatin bê bandorkirin. ***R-2***


## Jinan bi konferansê gavek girîng avêtin

Konferansa 3’emîn a Herêma Şehbayê ku berî çend rojan hat lidarxistin de ji hemû komun û meclîsan 150 delege beşdar bûn. Hevseroka Meclisa Herêma Şehbayê Wefa Hisên derbarê Konferansê de axivî û diyar kir ku jin di asteke bilind de tevlî konferansê bûn û da zanîn ku ev jî gaveke gelekî girîng e. ***R-3***



## Biryara DMME’yê bi komployê ve girêdayî ye

Parlamentera HDP’ê ya Êlihê Ayşe Acar Başaran, bal kişand ser biryara DMME’yê ya derbarê redkirina serlêdana Ocalan û got: “Ev biryar ji komployê cudatir nîne. Divê ev tecrîd bê rakirin û demildest Bîrêz Ocalan azad bibe. Di şerê bi tecrîdê re kûrtîr dibe de, tenê Kurd zirarê nabînin, hemû gelên Rojhilata Navîn ji vê zirarê dibînin. Biryara DMME fikarên civakê zêdetir kirin.” ***R-3***



## Gel bi neçûyîna ser sindoqan bersiv da

Li başûrê Kurdistanê hilbijartina parlamentoyê pêk hat û tevlîbûn pir kêm bû. Ji nivî zêdetir gel neçûn ser sindoqan. Ev helwesta gel weke ‘êdî tu hêviyên wan ji partiyên heyî nemaye’ hat xwendin. Çawa ku dengdayîn bi dawî bû, partiyan dest bi îtîrazan kirin. ***R-4***

## Hikûmeta Endonezyayê alîkarî xwest

Li Endonezyayê piştî ku erdhej û tsunamiya li girava Sîlawesî da li gorî bîlançoya hatiye ragihandin herî kêm 832 kes mirine. Ajansa Rêveberiya Afat a Neteweyî, ragihand ku dibe hê jî bi bi sedan kes di bin xirbeyan de mabin. Di warê peydekirina pêdiviyên jiyanî de zehmetî tê kişandin. Hikûmeta Endonezya daxwaza alîkariya navneteweyî kir. ***R-2***

## Li dijî qanûna “Netew Dewleta Yahûdî”dest bi grevê dikin

Qanûna ku Îsraîlê weke ‘Dewleta Yahûdî’ qebûl dike roja 19’ê Tîrmehê bi desteka Serokwezîr Benyamîn Netanyahû li Parlamentoyê hatibu erê kirin. Filistînî li dijî qanûna ku Îsralî weke ‘Netew,Dewleta Yahûdî’ dibîne, dest bi greva giştî dikin. Tê payîn ku li bajarê Ramallah ê Rojavayê Şerîa û bajarê Jatt yê Ereb lê dijîn ku dikeve bakurê Îsraîlê çalakiyên protestoyê bên lidarxistin. ***R-5***

# Di Şerê Tunekirina Terorê de 29 çete hatin kuştin

**Di Qonaxa Dawî ya Şerê Tunekirina Terorê a Pêngava Bagera Cizîrê de pêşde çûna şervanên QSD'ê ber bi bajarokê Hejîn ve dewam dike. Şervanên QSD'ê derbên giran li çeteyên DAIŞ'ê didin. Navenda Ragihandinê ya QSD'ê ragihand ku di 24 saetên dawî yên Şerê Tunekirina Terorê de 29 çete hatin kuştin û 3 erebeyên bombebarkirî hatin bê bandorkirin.**



Navenda Ragihandinê ya QSD'ê ragihand ku di 24 saetên dawî yên Şerê Tunekirina Terorê de 29 çete hatin kuştin û 3 erebeyên bombebarkirî hatin bê bandorkirin.
Navenda Ragihandinê ya QSD'ê bîlançoeya 24 saetên dawî yên Şerê Tunekirina Terorê eşkere kir.
Daxuyanî wiha ye:
"1-Eniya Baxoz: Şervanên me li gundê Sefaqinê bi desteka balafirên koalîsyona navdewletî bersiva êrîşkeke çeteyan ku erebeyên bombebarkirî û doçka û topên hawnê bi kar anîbûn, dan, di navbera şervanên me û terorîstan şer rûda, di encamê de hejmarek mezin çete hatin kuştin.
Hêzên me piştî şerên giran bi terorîstan re 1 km pêşde çûn, her wiha 9 nuqte girtin, paşê xebatên paqijkirina herêmê dane destpêkirin.
2-Eniya Hecîn: Hêzên me li vê eniyê erebeyeke bombebarkirî ya terorîstan teqandin beriya bighêje armanca xwe û 700 metre pêş de çû.
Şervanên me piştî şerên giran 8nuqte girtin û xebatên paqijkirinê dane destpêkirin, di encamê de miqdareke çek û cebilxane desteser kirin.
3-Bîlanço:
-Hejmara kuştiyên çeteyan: 29.
-Hejmara derbeyên balafirên koalîsyonê: 12.
-Hejmara nuqteyên hatin girtin: 17.
-Windahiyên terorîstan: 3 erebe û 3 motorsêklêtên bombebarkirî, navneda vegihînê û bargeheke cebilxane hatin rûxandin û alava pêwendiyan a Hîtra hate desteser-kirin.

# DAIŞ û El-Nûsra li Efrînê bi cih dibin

Çavkaniyên herêmî destnîşan kirin ku çeteyên DAIŞ û Heyet Tehrîr El-Şamê ku wek El-Nusra tê zanîn, li kantona Efrînê bi cih dibin.
Çavkaniyên herêmî ragihandin ku di demên dawîn de li kantona Efrînê civîneke Heyet Tehrîr El-Şamê (Cebhet El-Nusra) têkildarî reva çeteyên DAIŞ`ê ji zindanê û dizîna berhemên zeytûnan, çêbû.
Çavkaniyan da zanîn ku 10 çeteyên DAIŞ'ê ji zindana çeteyên Feyleq El-Şam a li herêma Cindirêsê reviyan.
Çavkaniyan diyar kir ku meclisên çeteyan yên girêdayî dewleta Tirk a dagirker ji şêniyên Efrînê re gotine wê berhema zeytûnan îsal tenê ji sedî 10 ya we be û ya din jî wê ji çeteyên meclisê re be.



Her wiha hat ragihandin ku çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nusra) bi çeteyên Cebhet El-Wetaniyê re li herêma Cindirêsê civiyane da ku hêzeke hevbeş ava bikin û bi vê yekê jî Cebhet Tehrîr El-Şam dixwaze li herêmê hebûna xwe rewa bike…*ANHA*

# YPG'ê nasnameya 7 şehîdan eşkere kir



YPG'ê nasnameya 7 şervanên YPG/YPJ'ê yên meha Îlon û Tebaxa 2014'an de li Kobanê û Cezaayê şehîd bibûn eşkere kirin.
Navenda Ragihandin û Çapemniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê nasnameya 7 şervanên YPG/YPJ'ê yên di berxwedana Kobanê û Cezayê yên di meha Îlon û Tebaxê 2014'an de şehîd bibûn bi raya giştî re par ve kir.
YPG'ê têkildarî mijarê ev agahî da:
"Pêşengên gelên ku têkoşîna azadiyê dimeşînin, şehîd in ku li hemberî hemû dijwarî û zehmetiyan li ber xwe didin, ji bêderfetiyan serkeftinên mezin diafirînin û di oxira vê yekê de canê xwe feda dikin. Ev yek bi helwesta bi hezaran şehîdan li Kurdistanê hatiye îsbatkirin. Şehîdên me hêviyên pêşerojeke azad kirine xeyalên ku dikarin pêk werin û bi dilsoziya xwe ya bi mirovahiyê re her yek bûye rewşenek. Şehîdên me di hemû qonaxên vê dîrokê de, her yek bûye abîdeyek û cihê xwe di dilê mirovahiyê de girtiye. Şoreşa mirovahiyê ku li Rojava û Bakurê Sûriyeyê pêk tê, li hemberî zehmetiyan roj bi roj berxwedana xwe mezin dike û li dijî çeteyên barbar ên DAÎŞ'ê têkoşîneke lehengane dimeşînin û destanên dîrokî nivîsandin. Yek ji van destanan jî di sala 2014'an de li Kobanê û Cezaayê bi helwesta qehremanî ya 7 hevrêyên me derketiye holê. 7 hevrêyên me di encama fedakariyeke bêhempa de tev li karwanê şehîdan bûne.




# Hikûmeta Endonezyayê alîkarî xwest

Hikûmeta Endonezya, piştî erdhej û tsunamiya li girava Sîlawesî da û şûnde daxwaza alîkariya navneteweyî kir.
Li Endonezyayê ji ber karesatên rû dayîn di peydekirina pêwîstiyên bingehîn ên jiyanê de astengiyan dikişîne. Amûrên alîkariyê hewl tê dayîn bigihînin cihên dûr. Ajansa Rêveberiya Afat a Neteweyî, ragihand ku dibe hê jî bi dehan û bi sedan kes di bin xirbeyan de mabin. Li gorî bîlançoya hatî ragihandin bi kêmanî 832 kes mirine.
Yekîtiya Ewropa ya destnîşan kir ku bi dehan saziyên alîkariya mirovî amadene ku alîkariyê bikin, paketa alîkariyê ya mirovî ku bihayê 1,5 milyon eûro pêk anî.
Li aliyê din ji ber erdhejê hikûmetê ragihand ku li sê girtîgehên cuda yên Endonezyayê 1,200 girtî reviyane.
Roja Înê li girava Sîlawesî 2 erjhej pêk hatin. Enstîtuya Jeolojî ya Amerîka (USGS) diyar kir ku yek ji pileya erdhejê 7,5 nîşan da.
Girava Sîlawesî ya di meha Tîrmeh û Tebaxê de di encama çend erdhejan de bû sedema mirina 500 kesî, dikeve bakurê rojhilatê girava turîstî ya Lombokê.

# Dagirkeran li Efrînê bi dehan Êzidî revandin

Artêşa Tirk a dagirker gelek welatiyên Êzidî yên ji gundê Qîbar yê kantona Efrînê revandin û agir bi darên bajarokê Meydankê xistin.
Çavkaniyekî herêmî ji Efrînê ragihand ku gelek Êzidiyên gundê Qîbarê, di nav de jin jî hebûn, dema ku dixwestin biçin nava darên zeytûnan, ji aliyê artêşa dagirker a Tirkiyê û çeteyên wê ve hatin revandin û birin cihekî nediyar.
Hate zanîn ku navê jineke ku hatiye revandin Hemîde Şêx Henan e.Derbarê mijarê de, heman çavkaniyê diyar kir ku artêşa a dagirker agir bi darên li girên derdora bajarokê Meydankê yê navçeya Şera xist û da zanîn ku bi dehan dar hatin şewitandin û çete nahêlin welatî agir vemirînin…*ANHA*





# Waşokanî dîrok û nasnemaya çandê ye

**Navenda Çand û Hunerê ya Waşûkanî a li Serêkaniyê di sala 2013'an de hat ava kirin. Bi taybet bi despêkirina şoreşa Rojava û pêre weke navendên çand û hunerê yên din ya Navenda Çandê ya Waşûkanî jî erkek girîng da ser milên xwe û di nava 5 pênc salan de xebateke girîng meşand.**



Melek DEMÎRTAŞ



Ku em li dîrokê binerin her dîrok û çanda kurdan rastî êrîş û qirkirnê hatiyê, ji ber ku bajarê Serê Kaniyê jî xwedî tabetmendiyek dîrok û çandek kevnare dîsa rastî heman pilan û êrîşê hate, lê bi saya şorşê dijim negihjte armanca xwe. Da ku ew dîrok û çanda resen di çavekê de hîn zindî binîme navendên çand û hunerê di vî milî de rolek girîng lîstin. Yek ji van navendan jî navenda çand û hunera Waşo Kanî ku di 2013'an de hate vekirin, ji sê koman dibistana mûzîkê û gelek beşê din di hundirê navendê hate vekirin. Ji bo ku em kar û xebatê navendaWaşo Kanî zanibin Rojnameya Ronahî serdna navendê kir û bi hevseroka wê Sûmeya Mihemed diyar kir ku dema gel û civak li çand û dîroka xwe xwedî derkeve tu hêz nikare we çand winda bike û her wê di civakê de zindî bimîne."

### ERKA ME PARASTİNA Û ZİNDÎKİRNA ÇANDÊ YE

Hevseroka Navenda çand û Hunera Waşo Kanî ya Serê Kaniyê Sûmeya Mihemed ser xebat, çalakî û projên navendê ev tişt anî ziman ku Serê kaniyê xwedî dîrok û çandek dewlemende, da ku ev dîrok û çanda bi hezarî salan qirbikin, ji hêla çeteyên Cebhet Elnûsre rastî êrîşê hate û wiha got: "Piştî ku Serkê Kaniyê hate rizgarkirin, da ku em çand û dîrokê biparêzin û her di civakê de zindî bikin, yekemîn xebat Navenda Waşûo Kanî ku di 9'ê Mijdara sala 2013'an de hate vekirin, ji bo wê jî bi kelecanek mezin û heyacan tevlîbûn ji navendê re çêbû, ku nêzî 200 endamê bi hemû beşan cihê xwe di navendê de digrin."

### WAŞO KANÎ DANESÎNA ÇAND Û HUNERÊ YE

Sûmeya bal kişan ser vanê Waşo Kanî û wiha got: "Waşo Kanî Şaristaniya Mîtaniya ye, danesîna çand û huerê ye, ji bo wê tiştekî xwezayî ku navê waşo Kanî li navendê bikin û wiha domand: "Rastî dema çand û hunerê tê gotin tenê mûzk, şano û dîlan tuneye, an jî netenê dahol û zurneye, her wiha beşê wêjeyî hî di nave xwe de dihewîne. Di heman demê de ku ev du salan dibistna mûzîkê di navendê de hatiye vekirin, şagirtên ji temenê 8 salî heye 25 salî ku niha 62 şagirt ser hemû cûreyên mûzîkê fêr dibin. Erê dibistana mûzîkê ye lê ew şagirt ser zanista mûzîk û çand û exlaqê jî hîndibin. Şagirt di vê dibistanê ser salekê perwerdê dibînin, ji ber ku piranî şagirtên dibistanê ne, ji bo wê jî di heftiyê de du caran perwerde ye, lê di demasla hevînî de perwerdê wan zêde dikin; ji bo wê jî ku heye niha tenê du dewre hatine dîtin. Di heman demê de da ku şagirt bi coş û hêz fêrbibin di her 3'ê mehan carekê di navend û dibistanan de çalakiyan li dardixin."

### XEBATÊ ZAROKAN SERKEFTÎ YE

Sûmeya anî ziman ku ji bo pêşxistin û rêxistina xebatê çandê projeyên nû têne avakirin û wiha got: "Projeyên komînan wekî (komîna govendê û komîna şano hate avakirin, ev komîn xebatê çandê bi rêxistin dikin, her wiha dikevin nav civakê de û têkîliya çand û civakê xurt dikin. Her wiha di dema dawî de karê herî serkeftî xebatê zarokan di 4.mihrîcana zarokan bû, ku ev zarokana bi boneya destpêkirina demsala xwendinê û da ku zarok bi coş tevlî perwerdê bibin li dibistanan çalakî li darxistin, di heman demê de li navendê her meh du caran şano li dardixin û da ku şano ji çarçoveya navendan derkeve li taxan û dibistanan jî tê pêşkêş kirin."

### XWENDİNA PİRTÛKAN JÎ ÇANDE

Hevseroka Navenda Çand û hunera Waşo Kanî Sûmeya Mihemed di axaftina xwe de bal kişan ser çanda xwendinê û wiha got: "Dema ku em dibêjin çand û huner, pêwîste em çanda xwendinê jî jibîr nekin, ji bo wê jî ji destpêka avakirina navendê de pirtûkxane hate vekirin. Lê di destpêkê de hijmara pirtûkan kêm bû, lê niha nêzî 6 hezar pirtûkên mijarê cur be cur û bi zimanê kurdî, erbeî, sûryanî û turkî jî hene. Ev pirtûkxane bûye wesîleya xurtkirina têkîliyan û danûstsandina mijaran, ku her endamê dema pirtûkekê dixwîne û bi dawî dike, ew endam mîna semîrekê ser mijara ku xwendinye ji hemû endman re li dardixe û wiha ser mijarê pitûkê nîqaş têne kirin. Bi vê mebestê endam fêrî çanda xwendinê dibin û him jî nîqa û nerînê cûrbecûr derdikeve holê, wiha jî hêz dide endman ku pirtûkan bixwînin û fêrî gelek mijar û çandan jî dibin û Sûmeye wiha bi dawî kir: "Civak û çand yek rihin û da ku em vî rihî biparêzin pêwîste em dîrok û çanda xwe nasbikin ji bo ku xwedî lê derkevin."

# Çalakiyên hunerî ji bo Efrînê didomin

Çalakiyên hunerî yên bi armanca piştgiriya pêngava rizgarkirina Efrînê li navçeya Ehdaş a Şehbayê hatin lidarxistin.
Çalakiyên hunerî yên bi armanca piştgiriya pêngava rizgarkirina Efrînê ku ji aliyê Tevgera Çand û Hunerê ve hatiye birêxistnkirin berdewam dikin.
Herî dawî çalakiyek li navçeya Ehdasê ya Şehbayê hate lidarxistin.
Di çalakiyê de Endama Tevgera Çand û Hunerê Ronahî Şêxo li ser armanca çalakiyan axivî.
Ronahî diyar kir ku armanca wan a çalakiyan piştgiriya pêngava rizgarkirina Efrînê û parastina çanda Efrînê ye.
Paşê, Koma Çiyayê Kurmênc a dîlanên gelêrî ya girêdayî Tevgera Çand û Hunera Demokratîk goendên xwe pêşkêş kir.
Koma Afrinerên Hêviyê şanoyek derbarê "bi hevgirtinê hêza mirovan xurt dibe û bi cûdahî hêza mirovan lawaz dibe", pêşkêş kir.
Di çalakiyê de, Koma Rojava şanoyeke li ser êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li hemberî welatiî û zarokên Efrînê û berxwedana li dijî dagirkeran hate meşandin pêşkêş kir.
Çalakî li navçeyên Şehba û Şêrawa ew ê dewam bikin.



# Li muzexaneya Berxwedana Sedsalê şevbêrka hunerî

Bi armanca bîranîna şehîdan û berxwedana Kobanê, li taxa Şehîd Serhed ku niha bûye beşek ji muzexaneya Berxwedana Sedsalê ya bajarê Kobanê, şevbêrkeke hunerî hate lidarxistin.
Li Taxa Şehîd Serhed a bajarê Kobanê ya nêzî deriyê sînor ê navbera Bakur û Kobanê de û niha bûye beşek ji mûzexaneya Berxwedana Sedsalê, di dema êrîşên çeteyên DAIŞ`ê de şerên herî giran li wê taxê rû dan. Çeteyan dixwest wê taxê bi temamî bigirin û piştre deriyê sînor bigirin, bi vê yekê wê Kobanê ji her çar aliyan de dorpêç bikirina. Lê şervanên YPG û YPJ`ê li hemberî van êrîşan berxwedaneke ku li tevahiya dinyayê deng veda, kirin.
Bi armanca bîranîna şehîdên Berxwedana Sedsalê û zindîkirina berxwedanê, Navenda Çand û Hunerê ya Baqî Xido ya kantona Kobanê, li beşa muzexane ya Taxa Şehîd Serhed, şevbêrkeke hunerî lidarxist. Bi dehan welatiyên Kobanê, şervanên YPG, YPJ û endamên saziyên civaka sivîl beşdarî şevbêrkê bûn.
Şevbêrk bi bîranîna cangoriyên azadiyê dest pê kir. Paşê Koma Şehîd Gîvara ya girêdayî Navenda Baqî Xido stran pêşkêş kirin. Her wiha helbestvan Hemê Kobanê jî helbestên xwe xwendin û şanoyek derbarê rewşa Efrînê de hate pêşkêşkirin…*ANHA*





## Perwerde bi zimanê dayikê

Derwêş M. FERHO

Sala nuh ya perwerdê dest pê dike. Bi hezaran zarokên me berê xwe didin dibistanan. Lê şertên ew tê de di gelek aliyan de dijwar e. Têkoşîna azadiyê li seranserê Kurdistan, êrîşên dijmin ji derdorê, aboriya bi pirsgirêk, civata di nav gelek tengasiyan de, kêmasiyên derfetan nûne sebeba pêknehatina sîstemek rêk û pak. Mixabin, bi hezaran zarokên me jî di nava van şertan de diçin dibistanan.
Li Bakur û Rojhilat perwerdeya bi zimanê dayikê ne mimkin e. Dagîrkeriya Turkiyê û Îranê ev rê li ber Kurdan girtine. Dagîrkeriya wan ne bes ji aliyê abori ye. Jiyana kultûrî, perwerdeya bi zimanê dayikê qedexe ye. Hebûna fizîkî jî di bin xeterê de ye. Qedexe bi hemû hêza xwe berdewam e. Hebûna Kurdî jî tê di bin talanê de ye. Her roj meriv têne kştin, her roj kevnoşopiyên Kurdan têne tunekirin. Her roj xwezaya Kurdistan tê bombekirin. Berxwedan û têkoşîna azadiyê jî bê navber berdewam e.
Li Başûrê Kurdistan herçend e rewş awakî din be jî gelek pirsgirêkan di nav xwe de vedişêre. Rast e, beşek ji herêmê rizgar e, hikûmet û xwediyê biyargehê Kurd in. Lê dîsa jî ne bes parçeyek ji xaka wan di destê hikûmeta navendî de ye, sîstema îdarî jî belawela ye. Li sê wilayetên ku îdara Kurdî heye biryargeheke navendî nîne û yek li ya din guhdarî nake. Her yek li gor heza xwe, li gor dilê xwe rojeva jiyana civakê dixwaze çarçewe bike. Perwerde, jiyana kultûrî, parastin, hêza ewlekariya herêmê û hwd... dûrî çareseriyê ne.
Rojava dimîne ku ew jî di rewşeke dijwar de dibuhure. Hêviyên mezin hene ku li Rojava mihawele ji bo çareseriya gelek pirsgirêkan heye. Di serî de yek biryargeh ne çend serî ne. Hêza ewlekariyê ne çend serî ye. Alfabe yek e û hestên neteweyî ne parçe parçe ne. Ev rewş jî gelek heviyan dide me.
Di vê qanaxa dijwar de divê rayedarên Rojava girîngiyeke mezin bidin rola perwerdê. Bi taybetî rola perwerdeya bi zimanê dayikê. Di serî de jî min got, rewş aloz e, dijmin hawîrdor dorpêç kiriye, ji bo tunekirina hebûna me bi xwe êrîş dike, lê hêzên qirêj jî dişîne ser me ku bighê armanca xwe. Hêzên me jî berxwedaneke bêhempa dikin, têkoşîna azadiyê berdewam e û serketi ye. Lê wezîfe li vir ne bes berxwedan û berdewam têkoşîna azadiyê ye. Giringiya perwerdê bi zimanê dayikê di vê qonaxê de roleke pirr mezin digre.
Divê lêgerîn pêkwerin ku baştirîn sîstem peyda bibe ku perwerdeyek hêja, bi wate û di pêşerojê de bi encam ji civaka me re di nava welatê me de bibe rastiyek jiyanê. Gelek mînak ji bo dîtina sîstemek hene ku meriv jê wate bigre. Welatên Skandînavya, Beljîka, Hollanda, Swîs, Kanada, hwd... Perwerdeyek baş bi zimanê dayikê, ne bes ji bo zarokên me lê ji bo pêşeroja me Kurdistaniyan tevan pêdiviyek mezine. Civakek bi perwerdeyek bi kalîte pêşeroja welêt saxlem dike.
Rektorê Zanîngeha Katolîk ya Leuven di vekirina sala nuh ya perwerdê de berî çend salan bi van gotinên xwe axaftina xwe ya bernameya radyo de qedandibû: Eger em refaheke baş ji bo civaka xwe bixwazin û pêşeroja xwe bikin bin ewlekariyeke mezin divê em sêstema perwerdeya xwe bi zimanê dayikê qewîn bikin. Divê em baş bizanibin ku perwerdeya bi kalîte yek ji çekên me yên herî girîng e. Divê pêdiviya gelek derdoran bi hêza me ya hişmendiyê hebe.

# 700 astengdar hatin tomar kirin

**Kiryarên hovane yên DAIŞ'ê gelek şopên kampax li pey xwe hiştin. DAIŞ'ê deverên ku di bin dagirkeriya xwe de digirt, gel bi wehşetê ditirsand û serî li rê û rêbazên der mirovî dixist. Yek ji deverên ku DAIŞ'ê hovîtiya ku nehatî dîtin lê pêk anî Reqa bû. Di dema dagirkeriya DAIŞ'ê bi sedan welatî hatin kuştin, dest û lingên wan hatin jê kirin.**

Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl a Reqayê, diyar kir ku wan 700 rewşên astengdariya derûnî û bedenî tomar kirine da zanîn pirraniya wan qutbûna dest û lingan in.
Têkildarî mijarê endama rêveber a Buroya Astengdaran a Taybet bang li hemû rêxistinan kir ku alîkariyê bidin wan.
Çeteyên DAIŞ`ê ne tenê avahî wêran kirin, ji ber kiryarên wan welatiyên Reqayê bi astengiyên bedenî û derûnî rû bi rû mane. Gelek welatiyên Reqayê ji ber qutbûna dest an lingên wan bê kar mane. Zarok jî di aliyê derûnî de bi bador bûn. Ji ber ku DAIŞ'ê li ber çavên zarokan kiryarên dermirovî dikirin lewra jî vê yekê di aliyê derûnî de tesîreke mezin li ser zarokan hişt.
Li gorî Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl a Reqayê ji bilî haletên astengdariyên derûnî, rêjeya astengdariya dest û lingan gihaşt 700 kesan.
Li gorî belgeyên tomarkirinê yên komîteyê sedema pirraniya astengdariyên lingan mayinên DAIŞ`ê ne. Di dema dagirkeriya DAIŞ`ê li herêmê de, çeteyan bi armanca tirsandina welatiyan û bi gelek hincetan, destên şêniyan an bi şûr an jî bi satûran qut dikirin.
Çeteyan bi zanabûn welatî li meydanan darve dikirin û bi gel didan temaşekirin. Vê yekê jî zexteke derûnî li şêniyan û bi taybet li zarokan kir. Gelek zarokên ku li Komîteya Tenduristiyê hatin tomarkirin, nikarin biaxivin.
Têkildarî mijarê Endama Rêveber a Buroya Astengdaran a Taybet Munîra El-Hesen wiha got: "Em hewl didin bi hemû derfetên xwe alîkariya astengdaran bikin. Heta niha tu rêxistinekê alîkarî nedaye. Em ji bo belgekirina wan dixebitin."
Munîra destnîşan kir ku li gorî belgeyên komîteyê pirraniya rewşên astengdariyê ji ber mayin û kiryarên hovane yên DAIŞ`ê ne û bang li hemû rêxistinan kir ku alîkariya pêwîst bidin astengdaran…*ANHA*




## Bi hatina zivistanê mazot tê belavkirin



Komîteya Sotemeniyê ya navçeya Tirbespiyê bi nêzîkbûna zivistanê re heta niha milyonek û 700 hezar lître mazot li şêniyên navçeyê belav kir. Her wiha stasyoneke taybet ji bo belavkirina mazotê ji cotkaran re diyar kir.
Komîteya Sotemeniyê ya navçeya Tirbespiyê bi hevkariya komînan, mazot li welatiyên navçeya Tirbespiyê belav kir. Ji bo her malê 400 lître mazot hat diyar kirin. Komîteyê heta niha milyonek û 700 hezar lître mazot belav kir û li gorî komîteyê pêwîstiya navçeyê bi 5 milyon û 700 hezar lître mazotê heye.
Belavkirina mazotê bi hevkariya komînan bi rê ve diçe û bi buhayê 50 lîreyên Sûriyê li şêniyan tê belav kirin. Tê payîn ku komîte xebatên belavkirina mazotê di nîvê meha Mijdarê de bi dawî bike.
Têkildarî mijarê Endamê Rêveber ê Komîteya Sotemeniyê ya navçeya Tirbespiyê Elî Remo diyar kir ku bi rêya komînan mazotê belav dikin û destnîşan kir ku xebatên belavkirinê bi awayekî baş dimeşin. Elî Remo diyar kir ku komîteyê ji 40 hezar heta 90 hezar lître mazot ji stasyona Beyandûr re diyar kiriye da ku li cotkaran belav bikin… *ANHA*

## Li Minbicê rewşa perwerdehiyê baş dibe



Hejmara xwendekarên dibistanên Minbicê û gundewarên wê sal bi sal zêde dibe. Bi destpêkirina sala perwerdeyê ya nû re hejmara xwendekaran gihişt 130 hezarî.
Hevseroka Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Minbicê Buseyna El-Hisên diyar kir ku ew texmîn dikin ku hejmar bigihîje 150 hezar xwendekaran.
Piştî rizgarkirina Minbicê ji hêla QSD`ê de, Rêveberiya Sivîl a Minbicê girîngî da warên xedemî, perwerdehî û tenduristiyê.
Ji ber ku xwendekar nêzî 3 salan di dema dagirkeriya DAIŞ`ê de ji xwendinê qut bûn, Rêveberiya Sivîl bi awayekî lezgîn dibistan vekirin. Di sala perwerdeyê ya 2016-2017`an de 217 dibistan hatin vekirin. Nêzî 75 hezar xwendekar di wan dibistanan de perwerde dîtin.Di sala 2017-2018`an de jî, ji ber pêla koçberiyê ku berê xwe dan Minbicê hejmara xwendekaran zêde bû û gihişt 125 hezar xwendekaran.
Di sala 2018-2019`an de 130 hezar xwendekar diçin dibistanan û tê texmîkirin ku hejmar zêde bibe.
Hevseroka Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Minbicê, Buseyna El-Hisên wiha got: "Ji ber avabûna ewlehî û aramiyê li bajêr, gelek welatiyên ku koçberî Tirkiye û dewletên din bûne vegerîn bajêr. Ji ber wê hêjmara xwendekaran îsal gihişt 130 hezar xwendekaran."Buseyna destnîşan kir ku ew texmîn dikin ku ev hejmar zêde bibe û bigihîje 150 hezar xwendekaran…*ANHA*

## Şaredariya Til Hemîsê bê navber dixebite

Şaredariya Gel a navçeya Til Hemîsê tevî derfetên sînordar jî, bê navber xizmeta welatiyan dike û bi nêzîkbûna zivistanê re gelek projeyên xizmetguzariyê bi cih dîne. Bi nêzîkbûna zivistanê re şaredariyên gel ên herêma Cizîrê xebatên xizmetguzariyê dikin.
Beşa Hawîrdorê ya Şaredariya Gel a navçeya Til Hemîsê ya herêma Cizîrê, beşek mezin ji çop û komên sergoyê di meha Îlonê de veguhestin derveyî navçeyê.
Têkildarî xebatên paqijiyê, rêveberiya şaredariyê destnîşan kir ku ji ber kêmasiya alavên xizmetguzariyê û paqijiyê gelek zehmetiyan di xebatan de dikişînin. Rêveberiyê da zanîn ku çop li nav taxan kom bûne û karkerên paqijiyê rojane û bi awayekî domdar û bi derfetên heyî dixebitin û taxên navçeyê paqij dikin.
Rêveberiya şaredariyê destnîşan kir ku cihê çopê bi 15 km ji herêmê dûr e û diyar kir ku ji ber wê xebatên alavên paqijiyê dereng dimînin.
Têkildarî projeyên ku Şaredariya Gel a navçeya Til Hemîsê wê pêk bîne, rêveberiya şaredariyê diyar kir ku şaredarî wê gelek projeyên mîna sererastkirina rêyan, avakirina rêyên nû û xebatên xuzmetguzariyê bi cih bînin…*ANHA*





## Fetişîzm+Faşîzm û Erdogan

Medenî FERHO

Zihniyeta Îttîhadiyan fetîşîzma Turk-î Îslam e. Fetîşîzm, ji dîsplîna akademîk dûr e û di destê dîktatoran de dibe dehşetengîz çeka tunekirina komên xelkê. Fetîşîzma Turk-î îslam, îro di bedena Erdogan de kat daye û li her derê, di her mercî de êrîşan dike û xwînê dirijîne.
Fetîşîzm, totem e û di bedena Erdogan de bûye rengê Xwedê; bûye şûrê kuştina nirx, pîrozî, maf, demokrasî û edalatê. Feylesofê sedsala 19.Auguste Comte, wateya fetîşîzmê, "di guhertinên olê de û kesên ku xwe di suretê xwedê de dibînin" dinirxîne. Marx jî, wek çavkaniya nîqaşên li ser guhertina cîhanê şîrove dike.
Tirkiye, êdî Erdoganland e û teza Turk-î îslam, di bedena Erdogan de kat daye û bi xwînê sor bûye. Balkêş e, gelek tirkên dewşirme, Erdoganê ku xwe di "suretê Xwedê de" dibîne, dibêjin "ew ji ba xwedê hatiye".
Cehalet-xeşîmî, tiştekî qirêj û sift bêhnpêketî ye: Zewatên ku sê-çar bavên Erdogan lêkolîn nakin û nabînin ku ew dewşirmeyê Rumên Derya Reş e, wî cûda nîşan didin. Bingeha vê xeşîmiyê, fetîşîzma Turk-î îslam e û bi gotinên weke "yek tirk, berdêla hemû cîhanê ye", " kesê bêje ez tirk im, çi bextewar e", "Tirkan li hemberî 7 duwêlên emperyalîst şer kiriye" û hwd. hatiye stewihandin.
Ev gotin, çavkaniya dûrketina ji mirovaniyê ne û îşkdana fetîşîzma Rurk-î Îslama ku di bedena Erdogan de bûye faşîzm e. Vê jî, civaka Tirkiyê "şilûşatîseqet" kiriye. Jiyana rojane ya "xîreta aramî", li Tirkiyê xera bûye. Dema ku di civakê de rêkûpekî, wekhevî nemîne, birêzî û exlak winda bibe, "xîreta aramî" jî têk diçe. Xîret, bingeha mirov û ademiyetê ye. Xîret nebe, îrade jî, mirov jî nîne, êdî fetîşa totemî dest pê dike.
Erdoganê di suretê Xwedê de, di civîna giştî ya Neteweyên Yekbûyî de, cîhan tehdîd kir; li Elmanya jî, tevahiya muxalefeta Tirk û Kurd tehdîd kirin. Tehdîda li Emerîka û Elmanya, tê wateya ku, pasîfîzma Ewropa û Emerîka ya li hemberî Erdogan, hevkariya Rusya bi Tirkiyê re, ew gihandiye vê qonaxê.
Erdogan, sinoran nasnake û ligel tehdîdên li cîhanê, di kesayeta Kurdan de mirovahiyê qir dike; piştî Efrînê, Başûrê Kurdistanê jî gav bi gav dagir dike. Ev, nastoljiyek tarejîk e û ne bi rasyonalîzma burokatîk re, ne bi trajediya kulturî re, ne bi pêdiviyên demê ve re têkildar e. Gunehkarî ye û ev gunehkarî para rêxistinên Kurdên Başûr, Hevkarên li Rojava, hevalbendên Kurdên li Bakurê Kurdistanê û bi taybetî gunehkariya hêzên navneteweyî ye.
Fetîşîzma Turk-î Îslam, di bedena Erdogan de, wek hêza ku kes nikare li hemberî wî raweste derketiye holê û ew jî bi taybetî wisa dide xuyakirin. Erdogan û fetîşîzma di suretê xwedê de, êdî Hîtler e û li hemberî cîhanê qarîşkêşiyê dike. Cîhana ku di teknolojî de, li ezman stasyonan çêdike, li hemberî metafîzîk û teolojiya Erdogan neçar û bêzar bûye. Ev trajedi ye û ziddê pêşketina dîrokê û diyalektîkê ye.
Fetîşîzma Îttîhadî, di bedena Enwer Paşa de, bû faşîzm, gelên Rum, Ermenî, Suryanî-Keldanî, Çerkez û civaka Elewî, Êzîdî qir kirin; piştre bû çavkaniya faşîzma Hîtler... Îro jî, di bedena Erdogan de kat daye!.. Eger wilo dewam bike, dikare li cîhanê bibe qalib û materyalîzma dîrokê tune bike. Di şerê duyemîn yê cîhanê de, fetîşîzma di bedena Hîtler de bû faşîzm, hate mahkum kirin, divê fetîşîzma di bedena Erdogan de, bûye faşîzm, demildest werê mahkum kirin. Acilyetek li pêşiya mirovahiyê heye; lîberalîzma ku li cîhanê serdest e, nikare hemû nirx û pîzoziyên mirovahiyê bike qurban û li hemberî fetîşîzma Turk-î îslamî ku di bedena Erdogan de bûye faşîzm, bêdeng bimîne.



# Jinan bi konferansê gavek girîng avêtin

**Konferansa 3'emîn a Herêma Şehbayê ku berî çend rojan hat lidarxistin de ji hemû komun û meclîsan 150 delege beşdar bûn. Hevseroka Meclisa Herêma Şehbayê Wefa Hisên derbarê Konferansê de axivî û diyar kir ku jin di asteke bilind de tevlî konferansê bûn û da zanîn ku ev jî gaveke gelekî girîng e.**



Hevseroka Meclîsa Herêma Şehbayê Wefa Hisên derbarê Konferansa 3'emîn a herêma Şehbayê de diyar kir ku tevlîbûna jinan di Konfiranisê de ji bo tevahî jinên Şehbayê gavek mezine.
Hevseroka Meclisa Kantona Şehbayê Wefa Hisên derbarê Konferansa 3'emîn a Kantona Şehbayê de ku 150 delege ji hemû meclisên komunan ên Şehbayê tevli bûn de nirxandin kir û da zanîn ku tevlibûna jinanên Şehbayê ya konferansê gelek girîng bû.
Wefa Konferansa 3'emîn a Şehbayê li Rêber Ocalan, cangoriyên azadiyê û li tevahî gelên li Şehbayê pîroz kir û wiha got: "Piştî 9 mehan bi armanca nîqaşkirina rewşa siyasî ya salekê, rewşa rêxistinî, rexne û rexinedayîn, kar û asta xebatan me ev konferans bi beşdarbûna hemû endamên meclîs û komînan û bi tevlîbûna hejmarek mezin a jinên Şehbayê li darxist. Tevlibûna jinên Şehbayê ku bi hişmendiya pergala baviksalar dihatin astengkirin hêzek mezin da me."
Wefa anî ziman ku tevlibûna jinan a konferansê jî nîşan dide fikir û felsefeya Rêber Apo bandoreke erênî li ser hişmendiya jinê kiriye û ji ber vê ye ku îro jin bi hejmareke mezin tevli civîn û konferansan dibin.
Wefa wiha dawî li axaftina xwe anî: "Ev konferans divê ji zûve bihata lidarxistin. Lê ji ber rewşa şer û pêvajoya heye ev demek dirêje ku konferans nehat lidarxisitn. Lê li gel hemû nebesî û rewşa siyasî jinên Efrînê bi tevlibûna xwe nîşan dan ku ew li gorî Projeya Netewa Demokratîk tevdigerin."…*JINNEWS*

## Biryara DMME'yê bi kompoyê ve girêdayî ye



Parlamentera HDP'ê ya Êlihê Ayşe Acar Başaran, bal kişand ser biryara DMME'yê ya derbarê redkirina serlêdana Ocalan û got: "Ne tenê gelê Kurd, hemû gelên Rojhilata Navîn ji vê tecrîdê bi bandor dibe û zirarê dibînin.
Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi sedema ku Rêber Ocalan di sala 2010'an de rastî "îşkence û muameleyeya xerab" hatiye serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropa (DMME) dabûn. Lê DMME 8 sal şûnde bersiv da parêzerên Ocalan û daxwaza parêzeran red kir. Bertekên li dijî vê biryara DMME'yê berdewam dikin. Berdevka Komîsyona Hiqûqî û Mafê Mirovan a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) û parlamentera Êlihê Ayşe Acar Başaran, tecrîda girankirin ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, destûr nedayîna hevdîtina parêzer û malbatê û biryara DMME'yê nirxand.
Başaran, diyar kir ku biyara DMME polîtîke û wiha axivî: "Ev biryar di encama bazarên mezin de hatiye dayîn. Tu caran DMME'yê biryarên wisa polîtîk nedeya. Hem biryara DMME û hem jî biryara cezayê disîplînê ya ji bo Ocalan hat dayîn bi hev ve girêdayîne û ji hev ne cudane. Ji bo ku hêzên navneteweyî yên li Rojhilata Navîn bigihin armanca xwe, DMME ev biryar ji bo Ocalan da. Hem di hiqûqa hûndirîn de û hem jî di hiqûqa navneteweyî de biryarên ji bo Ocalan tên dayîn, ji komploya 15'ê Sibata 1999'an ne cudatir in.
Li aliyekê desthilatdariya AKP û hevkarê wê MHP, li aliyê din jî nûnerên gladîoya Tirkiyê, hêzên navneteweyî yên tekparêz, înkarker di şexsê Birêz Ocalan de li Kurdistanê li dijî paradîgmaya derketî holê tevdigerin û hewl didin ji holê rabikin. Îro li Tirkiyê, Rojhilata Navîn û Kurdistanê qeyranek heye. Her ku diçe krîza aborî û zemînê şer kûrtir dibe. Taciz, tecawîz û qetilkirinên li ser jinan mezintir dibin. Em nikarin van hemûyan ji tecrîda li ser Birêz Ocalan serbixwe bigirin dest. Hemû bi hev ve girêdayîne."
Başaran, anî ziman ku di pêvajoya şer a li Rojhilata Navîn de, ew hêza çareseriya Ocalan a derketî holê hemû kesan ji nêz de dîtin û wiha dewam kir: "DMME bi vê biryara xwe hewl dide vê hêza çareseriya Ocalan bêdeng bike. Îro gotineke Birêz Ocalan jî, tenê bandorê li gelan neke, bandorê li hemû dengeyên Tirkiye û Kurdistanê dike. Yên ku çareseriyê naxwazin tecrîdê kûrtir dikin."
Başaran, destnîşan kir ku divê demildest tecrîd bê rakirin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Hemû bangên me yên ji bo rakirina tecrîdê bê encam man. Divê ev tecrîd bê rakirin û demildest Bîrêz Ocalan azad bibe. Di şerê bi tecrîdê re kûrtîr dibe de, tenê Kurd zirarê nabînin, hemû gelên Rojhilata Navîn ji vê zirarê dibînin. Bila baş bê zanîn biryara DMME fikarên civakê zêdetir kirin."

## Jinan gelek projeyên aboriyê pêk anîn




Navenda Aboriya Jinan a navçeya Dirbesiyê gelek projeyên taybet ji bo jinan pêk anîn û roleke girîng ji bo perwerdekirin û pêşxistina jinan di hemû waran de lîst.
Navenda Aboriya Jinan a navçeya Dirbesiyê, di Îlona 2015`an de bi armanca pêşxistin û zanakirina jinan di warê aborî de hate vekirin. Ji wê demê û bi vir ve navendê gelek projeyên cuda bi cih anîne. Ji bo pênasekirina rêziknameya hundirîn a Navenda Aboriya Jinan û şîrovekirina pergal û têgehên kooperatîfan gelek civîn ji şêniyan re hatin lidarxistin.
Ji yekemîn projeyên ku navendê pêk anîne, avakirina zeviyên sebzeyan li gundê Qolan ê girêdayî navçeya Dirbesiyê ye.
Her wiha 2 firin li bajarokê Zergan û li gundê Sefer ê girêdayî navçeya Dirbesiyê vekirin. Ji aliyê din ve ji bo avakirina kooperatîfên sewalkariyê li gundê Til Gidîş û yek din jî ji bo xwedîkirina pez û mirîşkan li gundê Etîşan xebat meşandin.
Ji kooperetîfên ku jinan cihê xwe di nav de girtiye, yek jî kooperatîfên çandiniyê ne.
Navendê gelek kooperetîf li bajarokê Zergan ava kirin û li van kooperatîfan genim û ceh tên belavkirin.
Têkildarî mijarê Endama Rêveber a Navenda Aboriya Jinan Gulistan Umer wiha got: "Ji bo pêşxistina aboriya jinan û ji bo ku jin bikarin xwe bi xwe bi rê ve bibin em bi şev û roj dixebitin."
Gulistan Umer diyar kir ku ew niha bernameya sala 2019`an a xebatên navendê nîqaş dikin… *ANHA*

## Li Mexmûrê jinan tecrîd şermezar kirin

Jinên Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin, şermezar kirin.
Jinên Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) li Saziya Malbatên Şehîdan civiyan. Di civînê de bal hate kişandin ser tecrîda girankirî ya dewleta Tirk li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dimeşîne û tecrîd hate şermezarkirin.
Di civînê de peyama KJK'ê hate xwendin. Di peyama KJK'ê de bal hate kişandine ser tecrîda girankirî ya dewleta Tirk li Îmralî dimeşîne û kampanya ku gelê Kurd û dostên xwe di serî de li Elmanya bi navê 'Tu xêr nehatî Erdogan' û welatên din ên Ewropa dimeşîne. Kar û xebatên wan hatin silavkirin.
Paşê jinên tevlî civînê bûn axivîn û tecrîd şermezar kirin.





## Rêber APO xetera li ser xwe his kiribû

Avesta AMARGÎ

Berî derketina Rêber Apo ji Sûriyê, dayîka Cahîde cara dawî diçe Şamê û beşdarî civîna Rêber APO dibe. Di civînê de Rêber Apo gelek nirxandinên dîrokî dike. Mijarên herî sereke yên li ser disekine, rewşa gelê Kurd û pêvajoya tevgera wan e.
Dayîka Cahîde, çûna dawî ya cem Rêber APO, ji çûyînên berî wê cudatir dinirxîne. Dayîka Cahîde, veqetîna bi êş ya ji Rêber APO, bi herikandina rondikên çavan û bi dilêşiyeke mezin behs dike. Ez bi wê behskirinê birim 20 sal beriya niha. Wiha behsa çûna xwe dike: "Berî ku Rêbertî ji Sûriyê derkeve ez çûm Şamê, gel wî. Taybetmendiya Rêbertiyê, ya pir ji kûr de ez bandor dikirim, hiskirina li hemberî bûyer, jiyanê û insan bû. Wê demê Rêbertiyê, xetera li ser xwe his kiribû. Dixwest derbarê xetera li pêşiya me de me şiyar bike. Lê yek kesî ji me di qoncika serê de jî derbas nedikir ku rojekê Serok bê girtin. Em jimareke zêde ji gel û hevalan kom bûbûn. Me nizanî wê Rêbertî ji Sûriyê derkeve. Hevalan sifreyeke mezin ya xwarinê amade kiribû. Rêbertiyê, bi xwe ew sifre hemû rast kir û raxist. Dema sifre rast kir, zivirî ji gel re got; ez nikarim bêjim ev derfet yên partiyê ne yan jî bêjim partî kî ye, ev derfet yên we ne. Rêber APO, piştî ji gel pirsî û got; ka nêrîna we li ser hevalan çi ye. Û ji hevalan jî pirs kir ka kêmayiyên gel çi ne. Wê demê gel heval gelek rexne dikirin. Gel partî di şexsê kodro de didît. Lê gel ji nêzîkatiyên hinek hevalan aciz bûn. Serok zivirî li çar pênc dayîkan meyze kir û ji her dayîkekê hin pirs kirin. Ji dayîkekê re got; niha zarokê te li kû ye, dayîkê got; li Helebê ye. Ji dayîka duyemîn pirsî; wê jî got; yû min li cizîrê ye. Serokatiyê got; binêrin her zarokekî we li cihekî ye, heval jî zarokên we ne, ma zarokên we kêmayiyan bikin hûnê qebûl kin? Na hûn qebûl nakin. Pêwîst e, hûn zarokên xwe çêkin û wisa nêzî hevalan bibin.
Serok ev gotin berî 20 salan gotibû. Rêbertiyê dixwest ji me re bêje eger ez ne li gel we bim jî hûn weke goşt û neynokê bi hev ve ne. Ji ber wê hunê her tim hev mezin bikin. Rêbertiyê em ji bo barekî giran hazir dikirin, lê me qet fam nedikir. Wê demê me gelek tiştên serok digotin fam nedikirin, lê dema îro ez li rewaşa me dinêrim baştir fam dikim û wateyê didimê. Serok, digot pêwîst e hûn her yek bibin serokek, lê me fam nedikir. Serok li ser nêzîkatiya hevalan ji hev re sekinî. Serok got; insan hebûneke zindî ye û timî di nava liv û lebatê de ye. Ji ber ku jiyana insan herikbar e, bê kêmayî najî. Got insan kengê bê kêmayî dijî, dema di qoncikekê de rûne qet kar neke. Lê eger insan di nava tevgerê de be, wê kêmayiyan bike. Lê ferqa kêmayiyan heye. Serok got; dema hevaleke we kêmayiyekê bike, bi qirka wî/ê bigirin heta bêje bes, bi ser de here. Lê dema te dît wê bikeve, pê bigire, bila nekeve. Eger tu bihêlî ku hevalê te bikeve, bizane tuyê rojekê pê lê bikî û herî. Lê dema te li ser piyan hişt û girt ber singa xwe, pir germ himbêz kir, wê ew germayiya te wê/î kesî li ser piyan bihêle. Serok digot; ji rexnekirinê netirsin, lewre rexnekirin mirov mezin dike û pêş dixe. Pêwîst e em jî riya mezinkirina mirovan şêwazê Rêbertiyê ji xwe re esas bigirin.

# Erdogan DAIŞ’ î ye, Ixwanî Muslimîne

**Endamê Komîteya Rêveber a PKK’ê Dûran Kalkan gefên serokkomarê Tirk Erdogan yên li ser bakurê Sûriyê nirxand û diyar kir ku Erdogan bi gefên ku li rojhilatê Feratê dike, bi xwe xema herêmên ji çeteyên DAÎŞ’ê hatine rizgarkirin dixwe. Kalkan got, “Erdogan DAÎŞ’î ye, Îxwan-î Muslumîn e.”**



Endamê Komîteya Rêveber a PKK’ê Dûran Kalkan, bibîr xist ku hişmendiya serwer a Tirk ku di rewşa heyî de hemû heyîna xwe û şer li ser dijminahiya Kurdan dike, êdî li ber hilweşînê ye û got: “Bi teqez ev dawiya hişmendiya faşîst û vê siyasetê ye.”
Endamê Komîteya Rêveber a PKK’ê Dûran Kalkan ku bû mêvanê bernameya Dilistan a radyoya Dengê Welat û têkildarî rojevê nirxaninên girîng kir.
Kalkan destnîşan kir ku divê sîstema li ser Kurdistanê tê sepandin rast bê famkirin û ji mînakên cuda yên cîhanê cuda ye û wiha axivî: “Ev ne qirkirineke mîna ya di sedsala 19 an 20’an a li ser Ermenî, Asûriyan hatiye kirin e, qirkirinek hê ji wê dijwartir heye. Ji bo wê Rêber Apo got; ‘Gelê di nava pencên qirkirina çandê de. Her dema ku Kurd ji bo azadiya xwe kete nava hewldan û çalakiyan, hema di cih de ev qirkirin û hevkarên mîtînger û qirker, bi hinceta bûne bingehê vê hevdu sûcdar dikin. Nesaxim 40 sal in li çiyayên Kurdistanê têkoşînek tê kirin, berxwedana azadiyê, şerê gerîla, hemû hêza xwe ji gel digire. Ev têkoşîn bandor li herêmên din ên Kurdistanê kir. Tayyîp Erdogan û Neteweyên Yekbûyî jî derdikevin dibêjin; ‘Bi destek û erêkirina Amerîka derketiye.’ Çi eleqa xwe bi vê heye. Sîstemeke wisa dana avkirin ku Kurd nikarin ji bo xwe tiştekî tenê jî bikin, wê azad nebin. Yanî Kurd nîne, divê nebin. Tam rewşekî qirkerinê ye.”
Kalkan gotinên Erdogan ên; ‘Em ê Rohilatê Firatê jî paqij bikin, ketiye destê terorê’ nirxand û diyar kir ku Erdogan bi van gotinên xwe xema herêmên ji çeteyên DAÎŞ’ê hatine rizgarkirin dixwe, dibêje di dema DAÎŞ’ê de ew herêm hê baştir bû, dide nîşandan ku DAÎŞ’î ye û wiha dewam kir: “Erdogan DAÎŞ’î ye, Îxwan-î Musilman e, divê cîhan tev vê bizane. Yên dibêjin OSO û El Nûsra, El Qaîde ne. El Qaîdeya Sûriyê El Nûsra ye. Nakokiyên zirav bi DAÎŞ’ê re heye. Bi gotina li dijî DAÎŞ’ê xwedî helwestin, xwe dispêre wê, sexte ye. Carekî din da nîşandan bê ka çawa rêxistineke terorê ava kir û destek dike.”
Kalkan got: “Çareserkirina pirsa Kurd, azadbûna Kurdistanê, jiyankirina gelê Kurd a bi vîna xwe li nava gelê cîhanê; tê wê wateyê ku têkçûna vê hişmendî û siyaseta faşîst û qirker a ji bo domandina heyîna xwe cîhanê dişwitîne. Demokrasî, azadî, biratî, ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn jiyaneke wekhev û biratî derkeve holê, ev jî tê wateya mirovahiya azad û avakirina cîhanê. Me têkoşîneke wiha pir bi pêş ve biriye. Dema em li rewşa Erdogan dinêrîn dibînin ku di nava qirkirina ji bo gelê Kurd amade kirî de , bi xwe ketiye nav, maskeya wî xistiye, hişmendiya wî hatiye tehşîrkirin, dawiya xwe aniye, wê di demeke kin de ji dîrokê biçe.”
Kalkan diyar kir ku bêyî berxwedan tu tişt nayê bidestxistin û wiha pêde çû: “Li derve jî li zindanan jî rojê 24 saetan berxwedan heye. Mazlûm û Kemal heta dawiyê li ber xwe dan. Beriya her tiştî fêmkirina rast, berxwedan e. Fêmkirin û sekna rast berxwedan e, xwerêxistinkirin, xweperwerdekirin û piştgiriya ji bo kesên bindest berxwedan e. Nivîs, afirînerê, têkiliya bi malbatan re û perwerdekirina wan berxwedan e. Ji bo jiyana azad di têkoşînê de çalakiyên biçûk û mezin tune. Ya girîng ew e ku mirov bi pencereyeke berfireh lê binêre. Li ku derê çi hewce be divê ew tişt were kirin. Heke ev axaftinek be, tevgerek be, helwestek be, greva birçîbûnê be, heke çi be divê ya rast ew were kirin.”…***ANF***

## Polîtîka AKP’ê bi DAIŞ’ê re li dijî Kurdan bû



Serokwekîla Koma HDP’ê Fatma Kurtulan , “Em ê hemû şaredariyên xwe ku qeyûm anîn ser û şaredariyên ku bi rayekî kêm me ji dest dan, bistînin” û diyar kir ew ê bi tifaq û nametên rast bikevin hilbijartinê.
Serokwekîla Koma HDP’ê Fatma Kurtulan, di sala nû ya meclîsê de axivî û xwest parlamentera HDP’ê ya Colemêrgê Leyla Guven bê berdan û meclîs ji vê şermê rizgar bibe.
Di serdema nû de Seroka Wekîla Koma Partiya Demokratik a Gelan (HDP) Fatma Kurtulan li meclisê civîna çapemeniyê pêk anî. Kurtulan, diyar kir ku wekî HDP’ê ji roja hatine avakirin heta niha rastî zextên gelek zêde hatin û wiha got: “Ev zextên li ser partiya me didomin. Me serdema 26’emîn a meclîsê li pey xwe hişt. Di vê serdemê de Hevserokên partiya me û parlamenterên me hatin girtin. Wekîltiya wan hatin xistin. Niha hê jî wekîla HDP’ê ya Colemêrgê girtî ye. Girtina parlamenterên me yên girtî li dijî Qanûna Bingehîn e. Em dixwazin wekîla me ya Colemerê Leyla Guven serbest bê berdan.
Kurtulan, di berdewama axaftina xwe de da zanîn ku AKP’ê Tirkiye xistiyie nava kriza Rojhilata Navîn û wiha dewam kir: “Bi DAÎŞ’ê re ketin nava hevkariyê. Polîtikaya AKP’ê ya bi DAIŞ’ê re li dijî pergala Kurdan bû. AKP bi vê polîtîkayê welat xist nava celb û krîza Rojhilata Navîn. Em hevdîtinên bi Almanya re dibînin. Kriterên Kopenhag binpê kirine. Kurdan bazar dikin. Serokomar Erdogan li aliyekî li Almanya bîrdariyê ziyaret dike, li aliyê din destûr nadin ku Dayikên Şemiyê çalakiya xwe pêk bînin. Ev pir li dijî hev in. Dayik bi salan in li hestiyên zarokên xwe digerin. Lê destûr nadin ku dayik daxwazên xwe bînin ziman. Dayikên ku hê jî negihiştine hestiyên zarokên xwe yên li Sûr û Cizîrê hene. Dema em vê yekê bidin ber çavan ziyareta Erdogan a Bîrdraiya li Berlinê dirûtî ye.”
Kurtulan derbarê stratejiya partiya wan a li ser hilbijartinên şaredariyê jî got, “Em ê hemû şaredariyên xwe ku qeyûm anîn ser û şaredariyên ku bi rayekî kêm me ji dest dan, bi perspektîfa serkeftinê bistînin.” Kurtulan wiha dewam kir, “Me gotibû em ê bi tifaq û namzetên rast xwe hazir bikin. Me di gelek civînan de got û em gihiştin vê encamê: Gelê me yê herêmî, rêxistinên me, rêxistinên jinan, rêxistinên demokrasiyê, hevalbendên me yên sirûştî û hevkarên me ne. Bi nîqaşên bi wan re, bi namzetên rast em ê bikevin hilbijartinê.”

## Pîrê: Erka serokkomariyê ya YNK’ê ye



Berdevkê YNK’ê Sedî Pîrê diyar kir ku wê mijara serokkomariya Iraqê li Parlamentoyê zelal bibe û got; “Ti lihevkirina me û PDK’ê li ser mijara serokkomariyê çênebûye. Ger walitiya Kerkûkê jî ji bo Kurdan be, wê ji bo YNK’ê be.”
Di 27’ê Îlonê de Parlamentoya Iraqê biryar hat girtin ku di 2’ê Cotmehê de hilbijartina serokkomariya Iraqê bê kirin. Lê heya niha YNK û PDK li ser namzetek lihev nekirine. Herdû aliyan jî namzetên xwe yên serokkomariyê diyar kirine.
Li ser vê yekê berdevkê YNK’ê Sedî Ehmed Pîrê anî ziman ku ew erk para YNK’ê ye û wê li Parlamentoya Iraqê bê zelalkirin.
Pîrê da zanîn ku ti lihevhatinek di navbera wan û PDK’ê de, li ser erkê serokkomariyê çênebûye.
PDK daxwaza walitiya Kerkûkê jî dike, lê berdevkê YNK’ê balkêşa ser vê yekê jî got; “Ger erkê walitiya Kerkûkê ji bo Kurdan be, ev ji bo YNK’ê ye.”…***ROJNEWS***


## Gel bi neçûyîna ser sindoqan bersiv da



Li başûrê Kurdistanê hilbijartina parlamentoyê pêk hat û tevlîbûn pir kêm bû. Ji nivî zêdetir gel neçûn ser sindoqan û ev helwesta gel weke ‘êdî tu hêviyên wan ji partiyên heyî nemaye’ hat xwendin.
Li başûrê Kurdistanê 3 mîlyon û 88 hezar hilbijarên fermî, ji bo parlamentoya ji 111 kursiyan pêk tê, çûn ser sindoqan. Piştî Referanduma Serbixwe ya 25’ê Îlona 2017’an, Artêşa Iraqê, di serî de Kerkuk hin herêmê dagirker kirin û ser vê dagirkeriyê re salek darbas bû. Gel eleqeyek zêde nîşanî hilbijartina salek şûnde pêk hat, neda. Di hilbijartinê de hinek nelirêtî hatin kirin û li hin bajarên mezin jî ji sedî 20 hilbijêr çûn ser sindoqan û deng dan.
Ligel vê yekê jî hin organên weşanê yên nêzî KDP’ê û YNK’ê ragihandin ku ji sedî 57.96 hilbijêr çûne ser sindogan. Sedema neçûna gel a ser sindoqan, bi nêzikatiyên li dijî êrîşên derve yên li ser herêmê tên meşandin nebûna yekitiyê ye. Dîsa ji ber krîza aborî ya tê jiyîn jî gel neçûn ser sindoqan. Gel êdî partiyên heyî weke hêza çareseriyê nabînin.
Li bendê ye ku encamên hilbijartinê dinava 72 saetan de bên eşkere kirin, lê ji niha de tê nîqaş kirin ku KDP li pêşe û YNK’e jî li gorî hilbijartinên derbas bûyî dengên xwe bilind kirine û weke partiya duyemîn tê xuyakirin.
Çawa ku dengdayîn di saet 15.00’an de bi dawî bû, partiyan dest bi îtîrazan kirin.
Li aliyekê ji bo hilbijartinê îtîraz tên kirin û li aliyê din jî mereq tê kirin ku wê kîjan partî hikûmetê ava bike, serokê parlamentoyê wê kê be, hikûmeta nû wê têkiliyekê çawa bi rêveberiya Bexdayê re deyne û ji bo krîzên aborî, siyasî û civakî wê çareseriyên çawa ava bike…***Erdogan Altan/MA***



# Divê hikûmeta başûr li ber dagirkeriyê rabe



**Artêşa Tirk ya dagirker nêzî 30 km axa başûrê Kurdistanê dagirkiriye. Nerazîbûna welatiyên başûr li dijî dagirkeriyê her roj zêdetir dibe. Lê hikûmeta başûr ti helwestekê nîşanî dagirkeriya Tirk nade. Welatiyên herêma Biradostê dagirkeriya Tirk şermezar kirin û diyar kirin hikûmeta herêmê hevkarê vê dagirkeriyê ye. Welatiyan xwestin ku hikûmeta başûr li dijî dagirkeriyê rabe.**

Welatiyên herêma Bradost dagirkeriya dewleta Tirk li Bradostê şermezar kirin û diyar kirin ku ji hatina leşkerên Tirk hikûmeta Başûrê Kurdistanê berpirse.
Leşkerên Tirk piştî ketin nava gundê Bermîz û Çiyadêl, ketine nava gundê Şapan ê herêma Bradost a ser bi parêzgeha Hewlêr. Ev jî bû cihê nerazîbûna welatiyên herêmê. Welatiyên herêma Bradost dagerkeriyaTirk şermezar kirin.
Yek ji welatiyên herêma Bradost Behmen Ferhad diyar kir ku cihê gumanê ye hikûmeta Herêma Kurdistanê destûr dide hatina leşkerên dagirker û got; “Mixabin çend salin em bindestê Tirkiyê ne. Welatî nikarin biçin gund û zozanên xwe. Ji ber leşkerên Tirk topbaran dikin, an jî didin ber guleyan.”
Siyako Qadir bal kişande ser mezinahiya herêma Bradost û got; “Bradost herêmek ji bo xwedîkirina lawiran guncave. Belê xwediyên pez ji aliyê leşkerên Tirk ve tên topbarankirin. Zererên giyanî û madî dighêje welatiyan.”
Qadir diyar kir ku hikûmeta Herêma Kurdistanê ji dagirkeriya Tirk berpirse û nabe li hemberî dagirkeriya Tirk û Îranê bêdeng bibe.
Ciwanê bi navê Hazim Hatem diyar kir ku ew weke ciwanên Bradost dagirkeriya Tirk şermezar dikin. Hatem diyar kir ku artêşa Tirk li herêmê hêzên xwe zêde dike û ev jî bûye cihê tirsek mezin din ava welatiyên herêmê de.
Hatem daxuyakirin ku divê hikûmeta Herêma Kurdistanê li hemberî dagirkeriya Tirk helwestek cidî nîşan bide.
Welatiyek din ê herêma Bradost Îskender Reşîd li ser dagirkeriya Tirk wiha got; “Bradost hatiye paşguhxistin. Desthilatdar 4 salan carek serdana Bradost dikin, mal bi mal digerin û dengan kom dikin. Dema me deng da wan, çûne parlamentoyê û bûne xwedî 8 milyon dînar êdî Bradost ji bîr dikin.”
Reşîd diyar kir ku Bradost bûye cihê pêşbaziya dewletên dagirker û axaftina xwe wiha bi dawî kir; “Tirkiye zêdetirê 27 kîlometre ketiye nava xaka Bradost û dagir kiriye. Ew desthilatên hikûmetê yên pesnên xwe didin, bila tenê bi gotinekê vê dagirkeriyê şermezar bikin. Li aliyek din Îran herêma me topbaran dike. Vê jî zererek mezin daye zozanên Bermîz û Kelaşîn.”…***ROJNEWS***



## Şandeya Fransî bi rayedarên herêma Cizîrê re rûnişt

Rêxistina La Guilde Europeenne Du Raid a Fransayê serdana herêma Cizîrê kir û bi rayedarên Desteya Têkiliyên Derve re civiya. Şandeyê diyar kir ku wê ji bo xurtkirina peywendiya çandî di navbera Fransa û Rojava – Bakurê Sûriyê de xebatên xwe zêde bikin.
Şandeya Fransayê ji aliyê hevserok û endamên Desteya Têkiliyên Derve ve hate pêşwazîkirin.
Şandeyê di serdana xwe de behsa hevdîtinên xwe kir û da zanîn ku tişta wan li Rojava dîtiye wê ji rayedarên Fransayê re ragihînin û wê peywendiya çandî di navbera Fransa û Rojava-Bakurê Sûriyê de xurt bikin.
Hevserokê Desteya Têkiliyên Derve Ebdilkerîm Umer derbarê pêşketinên dawîn ên li Sûriyê de axivî û bal kişand ser rewşa li Efrînê û diyar kir ku rizgarkirina Efrînê ji dagirkeriya Tirkiyê û komên çete mijara wan a sereke ye.

## Eniya Tirkmen malên Kurdan talan dikin

Çeteyên Eniya Tirkmen û Heşdî Tirkmen ên girêdayî Eniya Tirkmen in li Kerkûkê 150 malên Kurdan ên li bajar dagir û talan dikin, li şûna wan jî Tirkmenên Tilehfer û Dûz bi cih dikin.
Bi hezaran welatiyên Kurd ên ji ber êrîşên rejîma Sedam Huseyîn koçber bibûn, piştî hilweşandina rejîma Baasê vegeryabûn Kerkûkê, carekî din ji ber dagirkeriya 16’ê Cotmehê ya Heşdî Şebî û artêşa Iraqê koçber bibûn.
150 malbat ên ku serdana waliyê demê û meclîsê kiribûn li taxên Maeker Xalid tê zanin bi cih bibûn. Malbat piştî ku belgeya nav û îmzeya hemû endamên meclîs û waliyê Kerkûkê li ser girtin û şûnde li taxa Maesker Xalid bicih bûn. 150 malbatên ku li Maesker Xalidê bi cih bibûn heta bûyerên 16’ê Cotmehê û dagirkirina Kerkûkê ya ji aliyê artêşa Iraqê û Heşdî Şebî ve li vê herêmê dijiyan. Malbat ji ber êrîş û zextên demê neçar man ku malê xwe bihêlin, derbasî Qerehinar, Çîmen, Nawaşiwan, Tekeye, Çemçemalê bûn.
Vê carê jî Eniya Tirkmen û Heşdî Tirkmen ên ji aliyê Tirkan ve hatî perwerdekirin li bajarê Kerkûk ê Başûrê Kurdistanê 150 malên Kurd dagirkirin û ji cih û warên wan kirin.
Yek ji welatiyên ku ji aliyê komên çeteyên Tirkmen ve ji malê hatî derkirin Ezîz Abdullah e. Abdullah diyar kir ku dema komên çeteyên girêdayî Eniya Tirkmen 16’ê Cohmeta 2017’an herêm dagir kiriN, gotin ku Heşdî Şebî Tirkmen ji malên wan kirine der. Lê piştî du rojan dema ez çûm mal min dît ku 3 wesayîtên leşkerî tije çeteyên eniya Heşdî Tirkmen hatin bi lêdan û êşkencê û zorê em ji malên me derxistin.”
Hîwa Abdullah jî yek ji wan malbatên ku bi zorê ji malê wan kirine der e û li bajarokê Tekeye ya girêdayî bajarê Silmaniyê bi cih bûye. Hîwa Abdullah ê di nava xaniyên kirê de dijî got: “Komên çeteyên girêdayî Eniya Heşdî Tirkmen em ji mala me derxistin û rê nedan ku em tiştekî nava malê bigirin. Hemû amûrên li nava malê bihayê nêzî 10 milyon dînarê Iraqî ye, hemû ji aliyê çeteyên heşîd Tirkmen ve hatin desteserkirin û talankirin.”…***ANF***



## Li dijî qanûna “Netew Dewleta Yahûdî”dest bi grevê dikin

Filistînî li dijî qanûna ku Îsralî weke ‘Netew,Dewleta Yahûdî’ dibîne, dest bi greva giştî dikin.
Li Rojavayê Şerîa, Xazze û Rojhilatê Qudûsê ku Îsraîlê bi dagirkeriyê bi xwe ve girêda deriyên dibistan û cihên kar bi giştî hatin girtin.
Tê payîn ku li bajarê Ramallah ê Rojavayê Şerîa û bajarê Jatt yê Ereb lê dijÎn ku dikeve bakurê Îsraîlê çalakiyên protestoyê bên lidarxistin. Sedî 17.5 nifûsa Îsraîlê ji Ereban pêk tê. Ev ew Ereb in ku piştî avakirina Îsraîlê li ser xaka xwe mane.
Qanûna ku Îsraîlê weke ‘Dewleta Yahûdî’ qebûl dike roja 19’ê Tîrmehê bi desteka Serokwezîr Benyamîn Netanyahû li Parlamentoyê hatibu erê kirin. Ev yasa tenê maf dide Yahûdiyan ku qedera xwe diyar bikin û yekane zimanê fermî jî Îbraniye. Zimanê Erebî ku xwedî statuyekî taybete weke zimanê fermî nayê dîtin.
Bi vê grevê ji bo welatiyên gundê Han El Ahmer yê Rojavayê Şerîayê destek tê dayîn. Gundê ku 200 kes lê dijî ji aliyê Îsraîlê ve weke îllegal hate nirxandin û mehkumî hilweşandinê hate kirin.



## Îdlib vediguhere bela Tirkiyê

Zekî BEDRAN

Tê dîtin ku wê pirsgirêka Îdlibê bi hêsanî çareser nebe. Bu mijareke ku herkes têkil bû. Balkeşê, DYE û Ewropa li şûna ku piştgiriyê bikin çete ji Sûriyê bên derxistin û bên bê bandor kirin, li dijî wê derketin. Naxwazin ku Rûsya bibe xwedî bandor. Ev yek heta cihekî tê fêhmkirin. Lê hêzeke ku pirraniya wê El Nusra ye wê sozên çi bide DYE û Ewropayê ? Her wiha Tirkiyê Îdlib bi silehan dagirt. Tirkiyê çekên giran jî di navê de piştgiriyeke mezin da van çeteyan. Ev jî mijareke ku şer giran dike. Rûsya dibîne ku şerkirina bi hêzeke wiha re ne hêsan e.
Eşkereye ku rêjîm dixwaze bibe xwedî qadên ku qala wan tê kirin. Ji xwe di hêzên rêjîmê de ti guherîneke zihnî tune ye. Li şûna Sûriyeke demokratîk dixwaze ji nûve rih bide rêveberiya Baas. Dema wiha dibe, bi hêzên Bakurê Sûriyê re, yên ku piştgiriya herî mezin bidin demokrasiya Sûriyê jî, li hev nake. Dema bi hêzên Bakurê Sûriyê re li hev bike wê deriyên Sûriya nû heta dawiyê vebe û pêşî li destwerdanên hêzên derve were girtin. Tevî ku guherîna hişmendî ya rêjîmê tune ye, di aliyê hêz de jî lewaz buye. Tevî Îran û Rûsyayê xwedî wê hêzê nîne ku gavên serbixwe bavêje. Tevî Rûsyayê jî nikare operasyonê li ser Îdlibê bike. Di wateyekê de buye mehkûm.
Rûsya destpêkê di mijara Îdlibê de bi biryar xuya dikir. Lê Tirkiye weke nûnerên çeteyên çekdar derket pêşiya Rûsyayê. Ji bo Rûsyayê di wateyekê de muxatabekî rewa çê bû. Ji ber vê rewşê Kurd jî weke xwezayî hatin ser maseyê. Erdogan çawa ku weke berdevkê çeteyan li ser maseyê rûnişt, di heman demê de weke dijberê Kurdan ew jî anîn ser maseyê. Lewma derdê dewleta Tirk tenê beralîkirina Kurdan bû. Dubendiya “bila Îdlib beralî nebe Kurd beralî bin” dan pêş. Ev dubendîbûn ji bo Rûsyayê rewşeke bi feyde bû. Lewma Rûsyayê Efrîn pêşkêşî dagirkerên Tirk kiribû. Qertê Kurd qertekî gelekî bi feyde bû. Ger ku niha jî Kurdan bi rengekî bixe bazarê wê kî ji wan hesab bixwaze. Weke tê dîtin DYE û Ewropa tevî ku li gel Kurdan li dijî DAIŞ’ê şerekî hevpar dikin bi qasî yek ji dehê Îdlibê li Efrînê xwedî derneketin. Ji bo wan jî Kurd qertek bûn lê qertekî ku bi erzanî bikar bînin bûn.
Weke ku em timî desnîşan dikin Tirkiye xwedî heman zihniyeta DAIŞ û El Nusra ye. Kes nikare bêje ku Erdogan xwedî zihniyeteke demokratîk e. Ger ku Erdogan hinek nesîbê xwe ji demokrasiyê girtiba, wê nijadperest nebuya. Li dijî Kurdan bi DAIŞ’ê re tifaq nedikir. Li hemû dinyayê li dû Kurdan ketiye. Ji bo ku Kurdan ji ruyê erdê bibe bi şev û roj di nava tevgerê de ye. Niha jî hêzên li Îdlibê diparêze û li ser wan re dixwaze li Sûriyê bibe xwedî bandor. Ji xwe Rûsyayê kir ku Tirkiye bibe hevparê Sûriyê. Erdogan dixwaze berê hêzên li Îdlibê bide Kurdan. Li wir gelek hêzên çekdar komkiriye. Ger weke DAIŞ’ê berê wan bide Kurdan hem leşkerê wan namirin hem jî hêzêke ku bi erzanî bikarbîne wê di destê wan de bimîne. Li Efrînê wiha kirin, çeteyên ku ji Ereban komkirin li Efrînê ajotin eniyên şer yên pêş. Ger bikaribe wê Kurd û Ereban berî hev bide û ger bikaribe bîne pêşberî hev wê ji bo wan hê baştir be. Şerekî demdirêj yên Kurd û Ereban ji bo Erdogan alternatîfeke ku herî zêde dixwaze ye. Kurd û Ereb heta niha nehatin vê lîstikê. Ji xwe hemû derdor bi hev dane şerkirin, ger ev jî bibe li Sûriyê alozî wê hê kûrtir bibe.
Rûsya dibêje ku ew ê pêvajoyê li Sûriyê diyar bike. Lê Tirkiyeya ku dibeje bila li Îdlibê şer nebe, wê trajediya mirovî pêk were rêya şerekî nû vedike. Teqez bêyî ku demê winda bike û fersendê bibîne wê êrîşî herêmên Kurdan bike. Fikarên aşitî û mirovî yên Tirkiyê tune ye. Bi hemû demagojiyên ku dike hewl dide şert û mercên ku êrîşî Kurdan bike, ava bike. Erdogan di hemû platforman de qîr dike û dibêje ku kurd weke dijmin û hedef îlan kirine.
Ma ew ê Erdogan Îdlibê jî bifroşe, belê wê bifroşe. Lê tenê bila Rûsya li dijî Kurdan piştgiriyê bide. Ma ew ê DYE û Erdogan hevdu hembêz bikin, belê. Lê tenê bila DYE ji êrîşên li dijî Kurdan re bêje erê. Lê ger Kurd baş xwe birêxistin bikin û li ber xwe bidin di encamê de Sûriye wê ji bo Tirkiyê vegere lîlavekê û Pûtîn jî wê nikaribe wan rizgar bike.